Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :973 | 22-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ nameronahi@gmail.com ☎ 423165

# Çala reş ya herî zû mezin dibe, hat dîtin

**Space.com ragihand ku çala reş ya nû hatî keşifkirin, bi 500 qatî ji çala reş ya li navenda Kadizê mezintir e û ronahî bixwe jî nikare xwe ji hêza kişandina nava wê rizgar bike.**



Zanyar îdîa dikin ku çaleke reş a welê mezin keşif kirine ku Sîstema Rojê dikare bikeve navê.
Li gorî lêkolînerên Zanîngeha Neteweyî ya Awûstralyayê, çala reş her gavê bi qasî Cîhanê ji gerdûnê dixwe.

Lêkolînerê sereke Dr. Christopher Onken ji bo keşfê got, "Derziyeke gelekî mezin a li kadînê."
Space.comê ragihand ku çala reş a nû hatiye tespîtkirin ji çala reş a li navenda Kadizê bi 500 qatî mezintir e û ronahî bi xwe jî dema nêzî wê bû, nikare xwe ji hêza wê ya kişînê rizgar bike.

Dr. Onken û tîma wî diyar kir ku çala reş a nû hatiye tespîtkirin ewqasî dibiriqîne ku bi teleskopên amator jî dikare bê dîtin.
***ANF***

# Çop û gemera mehekê!

**Em mirov, her ku diçe, dinyayê pirtir qirêj dikin û me hay jê nîne ka em li pey xwe çop û gemareke çawa dihêlin.**



Em mirov, her ku diçe, dinyayê qirêj dikin û me hay jê tine ye bê ka em li pey xwe çop û gemareke çawa dihêlin. Gelo hûn qet lê fikirîne, heger em çop û gemera xwe ya mehekê navêjin û kom bikin, ew ê bişibe çi? Aha va ye aktivîstê hawirdorê Rob Greenfield. Ji bo çop û gemara mehekê ya ku tenê însanek li pey xwe dihêle nîşan bide, mehekê çopên xwe navêtin û kom kirin. Çopên xwe li pişta xwe bar kirin û bi xwe re gerandin. Di dawiyê de jî ev dîmenê balkêş derket holê. Mirovekî ku di nav çopên xwe de winda bûye!

Greenfield bi bîr xist ku mirov li ser çopên xwe cara duyan qet nafikirin û piştî davêjin, ew ji bîr dikin û got, "Dema çopên me ketin qutiya çopê, em êdî li wê çop û gemarê nafikirin, ango ji bîra me diçe. Ji bo bînim bîra xelkê û bikim ku mirov du caran li ser çop û gemara xwe bifikirin, min tiştekî wiha kir. Hêvîdar im, mirov bêhtir vê rewşê fêhm bikin û baldar bin." Greenfield bang dike û dibêje, bila mirov dev ji xerîdariya zêde berdin û tiştên bi kêrî wan nayên jî zêde edim nekin. Heya ji wan tê tiştên ku xwezayê neherimînin, bi kar bînin û di vê meseleyê de hişyar bin.
***Ozgûr Polîtîka***

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| Abone (Fransî) | 1.Kesê ji bo demekê rojname, kovar û hwed. dikire û pereyên wan pêşî dide: Ez aboneyê rojnameya Ronahî me. 2.Kesê çûna ciyekî ji xwe re kirî edet |
| Alternatîf (Fransî) | 1.Bedîl: Ku tu bi min re neyî jî alternatîfa min heye. 2.Cuda. 3.Dijber |
| Amanc | Kêlika ji bo ceribandina sekvaniyê tê vedan, yan ciyê ji bo vî karî tê diyarkirin û guleyan berdidinê. |
| Armanc | Tişta mirov dixwaze bi dest bixe, yan xwe bigihîniyê. Hedef, mebest, meram, mexsed, daxwazî, doz: Armanca me azadiya Kurdistanê ye |
| Dosya (Fransî) | 1.Agahî û belgeyên li ser heman mijarê, heman kesî û heman karî. 2. Qapê ji kartonan çêbûyî yê belgeyên bi vî rengî tê de kom bûyîn. |
| Pêşbînî. | Texmîna li ser paşrojê; baweriya bi bûyerên ku wê di demên pêş de biqewimin: Li ser paşroja Kurdistanê pêşbîniya te çi ye? |
| Pratîk (Fransî) | 1.Tiştên bi hêsanî pêk tên; tiştên bikeys. 2.Kesê ji pirsgirkan re bilez û bi hêsanî çareyan dibîne: Mirovekî pratîk e. |
| Qonax. | 1.Serdem, merhele, gihanek, pêvajo. 2.Dûrayiya ji derekê, mesafe, qeder. 3. Xan, qesir, saray, avayî |
| Yekser | Rastûrast, rêûrast, yekderb, rast, bênavber, bê ku biçe ciyekî din |
| Yekcar. | Ji binî, hîç, bi ti awayî, |

# Rêxistinên jîngehê: Metirsî li ser jîngeha Kurdistanê zêde bûne

**Li Silêmaniyê di panelekê de bal hat kişandin ser metirsiyên li ser jîngeha Kurdistanê û hat gotin, ji ber hin kiryarên mirovan ên wek qirêjkirina xakê û nêçîra zêde ya lawirên kûvî metirsî li ser xwezaya Kurdistanê çêbûye.**

Li Silêmaniyê ji aliyê sê rêxistinên bi navên Azadbûn, Sirûştî Kurdistan û Bîme ve panelek bi ser navê 'Hewarek bo jîngeha Kurdistanê' hat li darxistin û di panelê de li ser parastina xwezayê nîqaş hatin kirin.

Di panelê de Wênegir û Rojnamevan Xalid Silêman, Rêveberê Tiwêjînewey Destey Kurdistan Şagul Ebobekir axivîn. Panel ji aliyê Helwest Ebdullah ve hat birêvebirin.
Di panelê de Xalid Silêman îşaret bi metirsiyên li ser jîngeha Kurdistanê kir û got, "Ji berê cûdatir niha pileya germahiyê li Kurdistanê zêdetir bûye. Sedemên bilindbûna pileyên germahiyê ji ber kiryarên mirovan bi xwe ne. Her wiha yek ji sedemên din ên zêdebûna germahiyê berhemanîna gaza zêde ye ku Çîn û Amerîka ji sedî 40'ê gazê dixin nava av hewayê. Ev jî bûye sedem sîstema jîngehê têk biçe."




Xalid di dewamê de da zanîn sedemek din ê metirsiya li ser jîngeha Kurdistanê welatî bi xwene ku ji pêdawîstiyên xwe zêdetir av bikartînin û nêçîra lawir û balindeyên kuvî dikin. Xalid diyarkir li devera Germiyan li gelek cihan xezal û rûvî hebûn, lê ji ber nêçîra zêde li wan deran nemane.

Di beşek din a panelê de Şagul Ebobekir jî behsa kampanyek cîhanî ya bi navê 'Xak bi parêze' kir ku ji bo parastina jîngehê hatiye ragihandin. Şagul da zanîn divê rêxistinên jîngehê yên Kurdistanê jî tevlî vê kampanyê bibin.

Şagul diyarkir tişta herî zêde metirsiyê dixe ser jîngehê, qirêjbûna xakê ye.
***ROJNEWS***

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | P | E | R | E | ■ | M | E | D |
| 2 | T | A | ■ | O | ■ | N | Û | ■ | U |
| 3 | ■ | L | A | M | A | ■ | S | I | H |
| 4 | R | A | ■ | A | ■ | N | A | L | ■ |
| 5 | E | S | A | ■ | K | Î | ■ | A | D |
| 6 | Ş | ■ | R | E | ■ | N | A | M | E |
| 7 | ■ | Î | D | ■ | Ş | O | M | ■ | M |
| 8 | Î | Z | I | N | ■ | V | Î | N | ■ |
| 9 | Ş | ■ | K | A | M | A | R | O | T |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | ■ | | | | | ■ | | | |
| 2 | | | ■ | | ■ | | | ■ | |
| 3 | | ■ | | ■ | | ■ | | | ■ |
| 4 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 5 | | | | ■ | | | | | |
| 6 | | ■ | | | | | ■ | | ■ |
| 7 | | | | | ■ | | | | |
| 8 | | ■ | | | | ■ | | ■ | |
| 9 | | | ■ | | ■ | | | | |

### ÇEP-RAST

1. Gemara heywanên bibask... Wekî gijbûna pirça canê ajelan û tiştên wisa
2. Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax... Rastêşek
3. Dewara nêr
4. Koma mirovan... Notayek
5. Dijbera germ... Cihê bi gir û girik
6. Cihê ku xwarina heywanan tê de tê danîn
7. Penîrê ku ji şîrê xîç tê çêkirin, yê heta sê rojên ewil dikelînin û nemeye... Sala em tê de ne
8. Roja em tê de ne
9. Yezdanekî misrî... Bajarekî me

### JOR-JÊR

1. Ji bo bûkê, birayê zavê... Yaqûta şîn
2. Hejmarên du, çar, şeş, heyşt û hwd.... Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin
3. Kevirekî rengsedef û giranbuha
4. Notayek... Kesê ku ji dewra zarokatiyê derketiye
5. Bajarekî me
6. Bireke pez ku ji 100 hebî heta 200'î
7. Axayê binemalê an jî hozê... 12 meh an jî 365 roj
8. Elementên ne metal, mîna klor, fosfor û oksîjenê
9. Notayek... Îşaret, şop... Kesê ji gelê Polonyayê an jî, ji eslê vî gelê

# Çiyakurd bang li hikumeta başûrê Kurdistanê kir ku lêpirsînê bide destpêkirin bike


Bedran Çiyakurd ji hikumeta başûrê Kurdistanê xwest ku derbarê şehîdxistina têkoşer Ferhad Şiblî û hevriyên wî de lêpirsîneke zelal pêk bîne û got, rûdana kiryarên terorî li nava herêma başûrê Kurdistanê fikaran bi xwe re tînin. ***R-3***



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 973 | 22-Hezîran- 2022 | www.ronahi.net/ku/

# 'HIŞMENDIYA OCALAN JIYANA HEVPAR YA GELAN E'

Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Ozgur Erol got, "Abdullah Ocalan ji bo jiyana hevpar ya gelan her tim bi kûrayî û cidî xebitiye. Ji bo çareseriya pirsgirêka kurdî pêşniyarên çareseriyê yên berfireh pêşkêş kirine. Herwiha got, nêzîkatiya Ocalan jiyana hevpar ya gelan e." ***R-3***



## Di berhemên hunerî yên Japon de Kurd

Gulana borî li Tokyo li sînemayeke piçûk, temaşevanan belgefilmeke li ser mûzîka ji rêûresmê ya Kurdan temaşe kir û paşê ne bi ecêban li çepikan da jê re. ***R-7***



## Roja 19`ê Hezîranê, li Sûriyê cîhaneke çawa ya zarokan ava bûye?



Zarokên Sûriyê di nava jîngeheke tundiya piralî de qurbanên herî mezin in û bi awayekî hovane li hemberî wan tundî tê kirin. 19`ê Hezîraneke din û hê destdirêjiya zayendî li ser zarokan dewam dike. ***R-6***

## Berxwedana Îmralî bû roniya qehremanan

Jinên bajarê Qamişlo tecrîda li ser Rêber Apo şermezar kirin û gotin; berxwedana Rêber Apo ya li Îmralî, ji bo gel bû hêviya herî mezin ya serkeftinê, herwiha bi vê berxwedana xwe pir qehreman û berxwedêr gihandin. ***R-4***


## Serkeftina Metîna li Rojava nîşan e!
Dilyar Cizîrî ***R-4***

## Gelê Sûriyê şer naxwaze
Zekî Bedran ***R-5***

## Berê Îran û Israilê li şer e!
Ahmed Aktaş ***R-6***

## Civak û Şênî
Sîpan Şînda ***R-7***

## ‹ Dewleta Tirkan li hêviya teqîna kampa Holê û girtîgehên çeteyan e›



Hevserokê Yekîtiya Parêzeran ya Reqayê şiyarî da ku gefên dewleta Tirkan ya dagîrker derfetê didin ku şaneyên çeteyên DAIŞ`ê careke din vegerin herêmê û got, hebûna DAIŞ`ê mîna bombeyeke li ber teqînê ye ku gefan li seranserê Rojhilata Navî dixwe. **R-5**

## Komîteya Aboriya jinê hewl dide aboriya herêmê pêş bixe



Rêvebera Komîteya Aboriya Jinê ya Kongreya Star Armenc Mihemed diyar kir ku tevî gelek zehmetî û astengiyan, ji aliyê aboriya jinê ve gelek gavên mezin avêtine. Herwiha got, armanca me ji vî karî pêşxistina aboriya jinê li bakur û rojhilatê Sûriyê bi giştî ye. ***R-2***

# Komîteya Aboriya jinê hewl dide aboriya herêmê pêş bixe

Rêvebera Komîteya Aboriya Jinê ya Kongreya Star Armenc Mihemed diyar kir ku tevî gelek zehmetî û astengiyan, ji aliyê aboriya jinê ve gelek gavên mezin avêtine. Herwiha got, armanca me ji vî karî pêşxistina aboriya jinê li bakur û rojhilatê Sûriyê bi giştî ye.

**Darîn Silê/Qamişlo**

Tevgera jinên bakur û rojhilatê Sûriyê piştî Şoreşa Rojava ji aliyê pêşxistina aborî ve pir xabat kirine û aboriya civakê pêş dixin. Lewra jin mîna tovê jiyanê ye û her tişt li derdora wê digere. Di rewşên şer û ambargoyên ser herêmê de jî, hewceyî bi avakirina aboriya civakê di serî de ya jinê heye. Herwiha bi keda jinê û berhemên wê yên baş, gelek caran ambargoya li ser bakur û rojhilatê Sûriyê hatiye şkandin.

Di şoreşa Rojava de di warê siyasî, çandî, civakî û aborî de jin xebitîn û bi ser ketin. Herwiha gelek berhem û afrîneriya jinan derket holê. Yek ji wan berhemên ku roleke avaker di nava civakê de dilîze, Komîteya Aboriya Jinê ya girêdayî Kongreya Star e. Komîteyê digel derfetên kêm, zihniyeta desthilatdar û êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê, di warê aboriyê de encameke baş bi dest xist û roleke girîng di sivikkirina aloziya aborî de lîst.

Komîteya Aboriya Jinê sala 2015`an di şert û mercên herî zehmet de hat avakirin. Ji wê demê ve komîteyê aboriya jinê bi rê ve dibe, heta niha jî kar û xebatê didomîne û jinan bi awayekî sîstematîk û rojbiroj aboriya xwe pêş dixin. Herwiha komîteyê gelek projeyên girêdayî jinê pêk anîne û bandoreke erênî li aboriya herêmê bi giştî, bi taybetî ya jinan kiriye.

Derbarê kar û xebata komîteyê de, herwiha proje û planên wan yên îsal li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê, rêvebera Komîteya Aboriya Jinê ya Kongreya Star Armanc Mihemed ji me re axivî û diyar kir ku armanca wan ya sereke diyarkirina rola jinê di nava aboriyê de û pêşxistina çanda aboriya jinê ye. Da ku jin bixwe aboriyê bi rê ve bibe û di jiyanê de xwe nespêre ti kesî.

**`Jin bi keda xwe jiyaneke nû diafirînin`**

Armanc bîr xist ku armanca wan li bakur û rojhilatê Sûriyê ew e ku jin di warê aborî û çandiniyê de bi ser bikevin û aboriya xwe ava bikin da ku jin di kar û barê xwe bi keda destê



xwe, xwe bi rê ve bibin. Herwiha got, em dixwazin çanda aboriya jinan ya berê vegerînin û ji civakê re bidin xuyakirin ka çawa aborî bi destê jinan tê meşandin û jiyaneke nû bi keda jinê tê afirandin.

Armanc Mihemed da zanîn ku piştî avakirina komîteyê di 2015`an de dest bi projeya çandiniyê kirine. Herwiha got, me gelek komên jinan di nava çandiniyê de bi rêxistin kirin. Dema dawî jî projeyên aboriya jinan pêş ketin û ji bilî çarçoveya xebatên çandiniyê, jin derbasî gelek xebtên din, weke xebata pîşesazî, bazirganî, sewalkarî û hwd bûn.

**Hewldanên jinan di pêşxistina projeya Demsal de**

Armanc bal kişand ser projeya Demsal ya ku ji aliyê komên jinan ve li herêma Cizîrê tê kirin û wiha pê da çû: "Îsal em hewl didin projeyên çandiniya avdanê li herêmê pêş bixin. Bi taybetî projeya bi navê `Demsal` ya ku di malên bilastîk de, tevayiya cureyên sebzeyên havînê, çandina daran û xwedîkirina sewalan pêk tê. Em dixwazin vê projeyê li herêmên din jî pêk bînin, da ku derfetên kar ji tevayiya jinan re peyda bibin û çandinî li herêmê baş bibe. Projeya Demsal niha li bajarê Dirbêsiyê û Dêrikê heye, tevayiya xebatkarên wê jin in."

Armanc derbarê rewşa çandinî û sewalkariyê ya îsal de wiha got: "Berhema çandiniyê ya îsal lawaz bû. Çimkî baran kêm bariya û bandoreke neyînî li çandiniyê bi giştî kir. Ji bo wê jî wek Komîteya Aborî me pir sûd ji çandiniya îsal negirt."

**`Tevî zehmetiyan me gavên mezin avêtin`**

Armanc behsa zehmetî û astengiyên di pêkanîna projeyên komîteyê kir û axaftina xwe wiha domand: "Li hin deveran ji ber adet û kevneşopiyên civakê yên li beramberî jinan, em di avakirina projeyên mîna projeya Demsal de rastî zehmetî û astengiyan tên. Di nava civakê de jî hin malbat kar û xebata jinê, danûstandin wê bi civakê re û tevlîbûna wê di projeyan de qebûl nakin. Herwiha projeyên aborî û yên girêdayî jinê red dikin û rê li pêşiya projeyên jinan digirin. Lê tevî zehmetî û rewşa heyî me gavên pir mezin avêtin. Me gelek kargeh vekirin û proje pêk anîn. Wek kar-



geha kîsan û firûna nanê alî li Reqa, Pêşangeh Mobîlya Star li Hesekê û Qamişlo û kargeha Lavîn ya dirûnê li Hesekê. Ji bilî wê jî jinan xwerekên ji bo demsala zivistanê bi destên xwe hazir dikin."

Armanc Mihemed têkildarî plansaziyên îsal yên bi armanca xizmeta jinan, wiha got: "Ji bo birêxistinkirin û avakirina koperatîfan û aboriya jinan, herwiha zêdekirina tevlêbûna wan ji xebatê jinê re, emê li komînan civîn li dar bixin. Da ku em li gel avakirina komeleyên kooperatîfên çandiniyê, hin kargehên din yên girêdayê jinê vekin, wek kargeha qedehên kertonî û kargeha çêkirina makerona."

Di dawiyê de rêvebera Komîteya Aboriya Jin ya Kongreya Star ya bakur û rojhilatê Sûriyê Armenc Mihemed bang li hemû jinan kir, ku berê xwe bidin aboriya jinê û ji bo xizmetkirin û pêşxistina hêza jinê, projeyan pêşkêş bikin. Herwiha got, divê jinên li herêmê rola xwe ya aborî bilîzin û aboriya jinê pêş bixin.

# Foza Yûsiv: Wê bi şerê gelê şoreşgerî ev pêvajo bi ser bikeve

**Navenda Nûçeyan**

**Endama Meclisa Rêvber ya PYD'ê Foza Yûsiv teqez kir ku Partiya Yekîtiya Demokratîk li gorî her qonaxê xwe nû dike û got, ji bo parastina hebûna gelan, lidarxistina kongreyê di vê qonaxa hesas de ji bo gelê herêmê û PYD'ê pir girîng e. Herwiha peyama kongreyê ya herî girîng ew bû ku wê bi Şerê Gelê Şoreşgerî ev pêvajo bi ser bikeve."**

Bi dirûşma "Bi ruhê şerê gel ê şoreşgerî, em ê dagirkeriyê têk bibin û Sûriyeya demokratîk ava bikin", li gorî rêziknameya partiyê ku her du salan kongre bê lidarxistin, 19 Hezîranê 9'emîn Kongreya Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) li bajarê Hesekê dest pê kir. Li gorî komîteya amadekar, 700 delege ji endam, nivîsgeh û nûnerên partiyê li Bakur û Rojhilatê Sûriye, Kurdistan û Ewropayê tevli kongreyê bûne. Têkldarî vê mijarê Endama Meclisa Rêvber a Partiya Yekitiya Demokratîk PYD'ê Foza Yûsif ji ajansa JINHA re axivî .

**"Salên li pêşiya gelê herêmê salên çarenûsê ne"**

Foza Yûsif da zanîn ku salên li pêşiya gelê herêmê salên çarenûsê ne û wiha domand: "ji bo ku hebûna gelan were parastin di vê qonaxa hesas de kongreya 9'mîn hat lidarxistin. Salên li pêşiya gelê herêmê salên çarenûsê ne, ji ber ku hemû peymanên di sedsaliya derbasbûyî de çêbûn di van salan de careke din wê xwe nû bikin. Lewma wekî gelê Kurd û hemû gelên herêmê pêwîst e bi amadekerî, plan û bi stratîjiyek xurt em derbasî pêvajoyê bibin. Ji bo wê kongreya PYD'ê di warê parastin, civakî, Rêveberiya Xweser, ji bo pirsgirkên civakê û ji bo azadiya Rêber Apo bi her awayî wê xwe bigihîjîne biryarên gelekî girîng ku em di salên pêşiya xwe de bi têkoşîn, berxwedan û seferberiyek mezin pêşwazî bikin."

**"PYD'ê paradîgmaya Neteweya Demokratîk bingeh digre"**

Foza Yûsif bibîr xist ku Partiya Yekitiya Demokratîk di şoreşa Rojava de pêşengiyek mezin kir û wiha dewamî da axaftina xwe: "Gelê Kurd hêzek mezin ava kir di herêma Rojhilata Navîn de û bûye hêzeke ku dikare di nexşeya siyasî de cih bigre û bi bandor bike. Rola partiyên siyasî gelek girîng e ji bo pêşvebirin û pêşengiya vê pêvajoyê. PYD'ê




heta niha pêşengî û rolek pir mezin û girîng di Şoreşa Rojava de lîst. PYD'ê berpirsyariya çareserkirina pirsgirêka Kurd li Rojavayê Kurdistan girtiye ser xwe û bi erkên xwe yên neteweyî li hemberî her sê aliyên Kurdistanê dirabe û di warê herêmî û cîhanî de bi paradîgmaya Neteweya Demokratîk, ekolojî û azadiya jinan bandorek mezin li ser tevahî cîhanê dike."

**"Bi ruhê gelê şoreşgerî em ê dagirkeriyê têk bibin û Sûriyeya demokratîk ava bikin"**

Foza Yûsif teqez kir ku stratejiya Şerê Gelê Şoreşgerî bi rihê pêvajoyê ve girêdayî ye û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Li hemberî êrîşên hovane ku li ser gelê Bakûr û Rojhilatê Sûriyeyê pêk tê pêwîst e her ferdekî di civakê de xwe li hemberî parastinê berpirsyar bibîne. Parastina ax, şeref, şoreş û nirxên xwe berpirsyar bibînin, ji ber ku parastin tenê nakeve ser milên hêzên leşkerî. Hemû ferdên di vê civakê de li hemberî êrîşan rû bi rû ye. Lewma her ferdek pêwîst e xwe perwerde bike, di milê hişmendiyê de xwe zana bike. Ger em bigihîjin vê astê dijminê me zû bi zû cesaret nake êrîşî me bike lewma em dibêjin bi rihê gelê şoreşgerî em ê dagirkeriyê têk bibin û Sûriyeya demokratîk ava bikin."



# Di berhemên hunerî yên Japon de Kurd

Gulana borî li Tokyo li sînemayeke piçûk, temaşevanan belgefilmeke li ser mûzîka ji rêûresmê ya Kurdan temaşe kir û paşê ne bi ecêban li çepikan da jê re.

Gulana bihurî li Tokyoyê li sînemayeke piçûk, temaşevanan belgefilmeke li ser muzîka ji rêûresmê ya Kurdan temaşe kir û paşê ne bi ecêban li çepikan da jê re.

Gelek ji wan jî paşê daketin ser dike, cem muzîkvanekî Kurd ê vexwendî û li ber muzîka wî reqisîn. Ev çalakî tenê yek ji wan bû ku di çarçoveya berhemên hunerî yên li Japonyayê li ser Kurdan hatine çêkirin.

Esas li Japonyayê qederê 2 hezar Kurdî tenê hene. Ew heta niha tenê bi zilm û zora siyasî û bi helwêsta hikûmetên Japon a beramberî wan dibûn rojev. Lê niha ev awirê hanê diguhere û ber bi hilberîna hunerî ve jî diçe.

Ev belge filma li jor me behsa wê kir, "Voices from the Homeland (Dengên ji welat)" bû. Film par bi derhêneriya Natsuki Nakajima hatiye çêkirin û Xelata Mezin di kategoriya kurtefilman de di Festîvala Belgefilma a Tokyoyê de wergirtiye.

Natsuki Nakajima ya 27 salî, çûye Bakurê Kurdistanê da ku dîmenan ji bo belgefilma xwe bigire. Nakajima bi xwe jî bestekar e û dengbêjiyê gelek tesîr lê kiriye. Ew bi dengbêjan re behsa zilma dewleta Tirk a li Kurdan jî dike.

**Film û romanek**

Filmeke metraj dirêj jî Gulana bihurî li seranserê Japonyayê kete vîzyonê: "My Small Land (Welatkê min ê piçûk)". Film behsa jiyana keçeke Kurd a diçe dibistana amedeyî li wilayeta Saitama ya li bakurê Tokyoyê dike.

Rayedarên Japon, piştî ku doza bavê wî ya penaberiyê red dikin wî dixin nezaretê. Ew bi xwe hewl dide jiyana xwe dewam bike. Di karekî danekî rojê de ew kurekî Japon nas dike û film behsa serpêhatiya wan dike.

Dêrhênera filmê Emma Kawawada ya 30 salî ye. Ew dibêje, di navbera qebûlnekirina wê weke Japonî (bavê wî Ingilîz e) û qebûlnekirina Kurdan weke milet ji ber ku bê dewlet in, hin paralel hene û wê xwestiye wan nîşan bide. Lê wê tenê berê xwe nedaye zehmetiyên Kurdan ên li Japonayayê, wê çan-




da wan a dewlemend jî pirralî nîşan daye, nexasim jî dawetên wan û xwarinên wan. Jixwe, weşanxaneya Kodansha Ltd. romaneke xwe disipêre çîroka vê filmê weşand. Emma Kawawada bi xwe ew nivîsandiye.

**Xwarinên Kurdî**

Li Kawaguchi ya li wilayeta Saitamayê ku nifûsa herî mezin a Kurdan lê heye, Naomi Nakajima ya 64 salî dest pê kiriye dersên çêkirina xwarinên Kurdan dide. ji bo dersê jî kitêbeke çêkirina xwarinên Kurdan jî hatiye weşandin. Navê kitêbê "Sifra Kurdî" ye. Japon ji ber bikaranîna goştî pez, tirş û ava bacana û gelek baharatên tûj, xwarinên Kurdî balkêş dibînin.

***Ozgur Polîtîka***

# Têkoşîna bi sînemayê

**Haşim Aydemir: Tevgara azadî rê li ber van bûyeran vekir. Êdî Kurd di her karê xwe de bi rola sereke radibin. Hem di warê çîrokê hem jî di warê dîtbarî de sînema nirxan ava dike. Lê em dizanin bi sedan serpêhatiyên Kurdan hene ku hê jî nehatine ziman û li benda roja xwe ne.**

Derhênerê Kurd Haşim Aydemir, zêdetir bi filma "14'ê Tîrmehê" hat naskirin. Ew balê dibe ser peywira sînemayê û dibêje, heger em bi sînemaya xwe behsa xelkê xwe nekin, kes dê nikaribe serpêhatiyên me bibêje: "Em bi sînemayê alîkariyê didin pêvajoya azadiyê."

Haşim Aydemir piştî filma "14'ê Tîrmeh"ê, filma "Dema Dirîreşkan" çêkir. Her wiha wî filmeke bi navê "Dewrana li Sûrê" jî çêkiriye û xwestiye bi riya mîzahê rewşa Qirixên Amedê vebêje. Filma Dema Dirîreşkan niha li Ewrûpa û gelek cihên din tê nîşandan. Li gorî agahiyên Aydemir, dê di nava çend mehan de li Rojava jî were nîşandan. Aydemir diyar dike ku filma wî ya "Dewrana li Sûrê", dê payîza 2022'yan li Tirkiye û gelek bajarên Kurdistanê bikeve vîzyonê. Derhêner Haşim Aydemîr got, wan rêzefilma Ax û Jiyan, Malîno, Ref li Amedê çêkiriye û wiha dewam kir, "Sala 2012'an me belgefilma 'Dema Evîn Dikeve Dil' li ser girtiyên di rojiya mirinê de ne çêkir. Me berxwedana 14'ê Tîrmehê ku yek ji berxwedanên herî girîng ên Tevgera Azadiya Kurd e, kire film. Me derfet dît ku em êşkence, pêkanînên dijmirovahî û berxwedana mezin a tevgera azadiya Kurd li zîndana Amedê bikişînin. Di dîroka gelê Kurd de filmekî girîng bû. Di sînemayê de serdema min a herî girîng temsîl dike. Pêvajoya rêwîtiya min a sînemayê bû ku gihîşt qonaxekê. Filma '14'ê Tîrmehê' di nasnameya min a sînemayê de xwedî roleke diyarker e. Ez wisa difikirim ku min bi huner û sînemayê tevkariya têkoşîna azadiya gelê xwe kiriye. Ez dikarim bibêjim, ew filmek e ku, ez afirandim. Ev film bi dînamîkên xwe, sînemager û hunermendên xwe di danasîna berxwedana Tevgera Azadiyê de bi roleke girîng radibe. Gelê Kurd filma 14'ê Tîrmehê hembêz kir. Me bi gel re li sînemayan temaşe kir."

**Tevgera azadiyê pêşiya me vekir**

Aydemir behsa pêvajoya hilberîna hunerê Kurd jî kir û got di warê siyaset, wêje û hunerî de gelek pêşketin çêbûne û ev yek jî bi têkoşîna gelê Kurd ve girê da: "Tevgara Azadiyê rê li ber van bûyeran vekir. Êdî Kurd di her karê xwe de bi rola sereke radibin. Him di warê çîrokê him jî di warê dîtbarî de sînema nirxan ava dike. Lê em dizanin bi sedan serpêhatiyên Kurdan hene ku hîna jî nehatine ser ziman û li benda roja xwe ne. Tenê ji ber dîroka Tevgera Azadiyê ya 40 salan, bi hezaran çîrok derdikevin. Her wiha serhildanên Kurdan hene, Kurdan ti carî li hemberî zordestan serî netewandiye. Di siberojê de dê ji van serpêhatiyan û serhildanan gelek çîrokên sînemayî derkevin. Wek sînemavan divê em jî bi hunerê xwe vê yekê bibînin û van serpêhatiyan bikin film."

**Pêşengiya Yilmaz Guney û Xelîl Dag**

Haşim Aydemir behsa sînemavan Xelîl Dag û Yılmaz Guney kir û got, sînemaya wan di warê sînemayê de riya wî ronî kiriye û peywira wan ya ji bo sînemaya Kurdî ya ku bi cih anîne wiha anî ziman, "Yilmaz Gu-



ney bingehê sînemaya Kurd danî. Bi filmên xwe nasnameya Kurdî derxist pêş û berê kamerayê da êş û serpêhatiyên gelê xwe. Wî bi huner û zimanê sînemayê, karên bêhempa derxistin holê. Xelîl Dag jî dixwest li warên azad sînemayê bi pêş bixe û weke gerîlayekî bi vê yekê bawer bû. Di vî warî de pêşengiyeke baş kir, heza ku tevgera azadî di warê siyasî de derxist holê wî jî di warê sînemayê de vê yekê nîşan da. Ne sînemayake pasîf lê ruhê sînemayeke çalak ya ku Kurd edî bi xwe bawer in, nîşanî xelkê da. Di şexsê Xelîl de me dît ku dema merivek xwe ji kesayeta mêtîngehiyê rizgar kir, ew dikare hîmên sînemayeke azad jî dayne."

**Piştî Xelîl Dag yekem filma gerîla**

Aydemir bi bîr xist ku piştî Xelîl Dag, filmên gerîla nehatin çêkirin ji ber wê, ew filma "Dema Dirîreşkan" weke dewama filmên gerîla dibîne û wiha dibêje, "Filmên Xelîl Dag hebûn, me li hemûyan temaşe kir. Filmên wî tesîreke baş li me kir. Ev filmên ku di nav şert û mercên dijwar de hatibûn çêkirin, kela canê me rakiribû û me bi vê kelecanê li Kurdistanê bi awayekî profesyonel filmekî gerîla çêkir. Hunermend nikare xwe ji bûyerên rast dûr bixe, nexasim pêvajoyên salên 90'î qet naçin ji bîra min. Birayekî min jî gerîla bû û gelek caran gundê me jî hate şewitandin. Ji lewma, min xwe da ber vê filmê û min xwest vê rastiyê bi riya filmekê bînim ziman."

**'Dewrana li Sûrê' dê gel bikenîne**

Haşim Aydemîr di dawiyê de behsa filma xwe "Dewrana li Sûrê" jî kir û got, "Em panoramaya Amedê bi sê karakterên bi navê Doto, Titî û Şaşo ku di salên 90'î de bi çanda Qirixan mezin bûne, xêz dikin. Bi rastî jî me hewl da ku bi rêya sê hevalan, bi her amûra teknîkî ya sînemayê, serpêhatiyên gelê Amedê bi awayekî belgefilmî pêşkêş bikin. Sirri Sureyya Onder û gelek lîstikvanên hêja beşdarî filmê bûn. Wê di payîzê de ji gelê me re bê nîşandan. Me hewl da ku cîhana dramatîk a ku Kurd tê de, hinekî bi henekî rave bikin da ku gelê me hinekî bikene. Li pişt me gelê me yê bi hêz heye. Li Amedê jî gel em hembêz kirin. Hunermendek heta ku ji gelê xwe qut nebe, wê serketî be.

Yekane xema me ew e ku em bi her awayî xwe bigihînin gelê xwe yê li her derê. Em carna di şanoyan, carna di festîvalan, carna di televizyonan û carna jî di medyaya civakî de hewl didin filmên xwe bigihînin gelê xwe."

***ANF***

## Civak û Şênî



**Sîpan Şînda**

Civaka Kurd civakeke gelek belawela ye. Hem ji ber ku welatê me çar qet e, hem jî her çar welatên dagîrker welatiyên Kurd tert û belav kirine. Gelek Kurd ji welatê xwe derketine û li dinyayê bi taybetî ji li Ewropa belav bûne. Hinek ji ber xîzaniyê lêbelê pirrê wan ji ber işkenca û zilima dijminî welatê xwe terikandine. Jixwe li welatê xwe herr roj ji aliyê dagîrkeran ve tên bombebarankirin, talankirin û kuştin. Zarokên Kurdan her roj li mala xwe, li dibistanê, li kolanê tên kuştin û ji aliyê dijminên dagîrker ve wek "terorîst" tên îlankirin û li dunyayê têt belavkirin. Kuştina zarokên neh deh salî ne bes e, li ser halê xwe re jî dibin terorîst! Bêguman dagîrker ne tenê bi kuştinê ve mijûl in. Ew planên xirabtir dikin û li ser Kurdan didin meşandin. Ev sed sal in ew di civînên xwe yên herî girîng û astên bilind de planan çêdikin ka wê çawa welatiyên Kurd kêm bikin. Bi taybetî li Tirkiyê li ser vê mijarê dewletê gelek serê xwe êşandiye û bi awayekî pisporî, heta bi awayekî qirêj vê polîtîkaya xwe bi rê ve dibe. Berê bi rêya radio, TV û rojnemeyan, îro ji gelek alavên din jî ser ve kirine û binhişiya civaka Kurd dagîr dike da ku zarokan çênekin yan jî kêm çêkin. Heta salên 1990 an jî ji pergalê re gelek zehmet bû ku rêjeya zarobînê di nava Kurdan de bêxe bin destê xwe. Piştî ku gundên Kurdan hemû şewatindin û Kurd li bajaran kom kirin, êdî ji wan re rehettir bû ku rêjeya zarobînê kontrol bikin. Ji aliyekê ve her tim êrîşî binhişiya civakê kirine û zarok çêkirin weke tiştekî paşdemayî dane pêş. Ji aliyê din ve jî bi rêya dermanan gelek jinên Kurd yên li halekê zarokên wan ji ber wan birine. Bi vê jî nemane, bi hêceta nexweşiyan gelek jinên Kurd derzî dane û şixre kirine û ji wan re gotine ji ber nexweşiya bi te re derketî êdî zarokên te çênabin. Lê ya ji vê xirabtir, dagîrkirina binhişiya civakê ya derbarê zarokçêkirinê de bû. Evê weke her tiştî nêrîna civakê ya di vî warî de jî guhert. Di nava Kurdan de zarokçêkirin û zêde zarokheyîn weke tiştekî pîroz dihat dîtin. Hem şert û mercên jiyana civakî û hem jî ya olî li ser malbatan ferz dikir ku zarokan çêkin. Lêbelê pergalê bi rêya propagandayê ev yek guhert. Bi taybetî jî di nava nifşên nû yên diçin zanîngehan dixwînin de ev hişmendî pirr pêş ketiye. Pirrê xwendayên Kurdan dema dizewicin êdî zarokekêduduyan çêdikine û hew. Ji ber wê jimara Kurdan li bakurê Kurdistanê li gorî berê kêmtir dibe. Lêbelê ji aliyê din ve jî desthilatdarî her roj bangî Tirkên xwe dike û dibêje wan zarokan zêde çêkin. Pergal di vî warî de dizane ka çi dike, lêbelê Kurd di xewê de ne. Min di raporeke Lijneya Berevaniya Neteweyî (MGK) ya Tirkiyê xwendibû ku tê de digotin; heke ev hal dewam bike wê di 2050 yê de jimara Kurdan ji ya Tirkan bibore. Ji ber wê divê pêşî li vê yekê bê girtin. Va ye îro em êdî encamên tedbîrên pergalê yên di vî warî de dibînin. Jixwe Kurd di warê ziman û çandî de li Bakur têk çûne, va ye îro di warê jimarê de jî paş ve diçin û jixwe pergal jî vê dixwaze. Ka emê çawa bikarin vê bi serê Kurdan bêxi ku dijmin bi zanebûn vê bi wan dide kirin!

# Roja 19`ê Hizêranê, li Sûriyê cîhaneke çawa ya zarokan ava bûye?

Zarokên Sûriyê di nava jîngeheke tundiya piralî de qurbanên herî mezin in û bi awayekî hovane li hemberî wan tundî tê kirin. 19`ê Hezîraneke din û hê destdirêjiya zayendî li ser zarokan dewam dike.

**Xalid Etê/Qamişlo**

Krîza li Sûriyê ku ji 2011`an heta niha didome, krîza duduyan ya herî giran piştî şerê cîhanê yê duduyan (1939-1945) e. Li gorî amarên UN û SOHR`ê heta dawiya sala 2021`ê, 610 hezar qurban, 100 hezar windayî û 13 milyon koçber ji ber krîza li welat çêbûne.
Li Sûriyê di nava van salên şer de, krîzê tundî û zirareke mezin gihandiye mirov, xweza û avayiya bingehî. Lê li gorî pisporan, yên herî zirarê dibînin û bi rewşa heyî pirtir bibandor dibin, zarok in. Lewra têghiştin û hêza wan ya fîzîkî ji bo xweparastinê ji tundiyê hê bi temamî ava nebûye. 19`ê Hezîranê ku Roja Cîhanê ya Têkoşîna Li Hemberî Destdirêjiya Zayendî ya di rewşa şer de (Neteweyên Yekbûyê ji sala 2015`an ev destnîşan kir) zarokên Sûriyê piştî 11 salên şer di çi rewşê de ne?

### Bandora Şer, êrişên dagîrkeriyê û krîza 11 salan ya li ser zarokên Sûriyê

Li gorî rapora UN (11`ê Adara 2022`yan) li Sûriyê 5 milyon zarok piştî 2011`an ji dayîk bûne ango di pêvajoya şer de jiyane. Heman saziyê teqez kir ku 553 hezar zarok rastî birçbûneke bêhempa hatine. Herwisa 265 hezar jinên dujanî rastî birçbûneke giran ku dibe sedema lewzbûna bedena wan, hatine. Herwisa ji sisiyan yek ji malabatên Sûriyê diyar kirin ku zarokên wan bi nexweşiyên derûnî ketine. Herwisa sala borî 900 zarokî jiyana xwe ji dest daye (ji sisiyan yek ji wan ji ber mayînan bû). Ev jî jimara zarokên qurban ji sala 2011 heta 2021`ê, li gorî rapora UN`ê digihîne 13 hezar zarokî. Herwisa rêxistina SEVE THE



CHILDREN ya Almanî bi raporekê (15`ê Adara Îsal) Sûriyê wek jîngeheke ji zarokan re pir bixeter pênase kir û got, 14 milyon û 600 hezar zarok hene. Ji wan 6 milyon û 500 hezar zarok pêwîstiya wan bi alîkariya mirovî heye. Herwisa sala 2021`ê 2 milyon 400 hezar zarok ji dibistanan



dûr ketine. Ji aliyekî din ve zewicandina keçan temenpiçûk û bikaranîna zarokan di kar û leşkeriyê de pir bûye."
Ji aliyê perwerdeyê ve jî, amarên fermî yên hikumeta Şamê diyar dikin ku heta 2021`ê ser 10 hezar dibistanî re ango ji sedî 42 ji dibistanên Sûriyê, zirar dîtine û nîvê wan jî hilweşiyane.

Jixwe li gorî Navenda Numbeo Crime Index ya Loklînan ya Amerîkî sala 2021`ê li ser asta cîhanê Sûriyê ji aliyê sûcan ve, di navê de sûcên li hemberî zarokan, ya nehan bû.

### Li hemberî zarokan destdirêjiya zayendî

Destdirêjiya zayendî ya li hemberî zarok, li gorî pîvannên mafên Mirovan yek ji sûcên herî nemirovan tê nirxandin. Lê tevî wê ev sûc li seranserê cîhanê tê dîtin û li Sûriyê berî krîzê jî hebû. Ev sûc jî bi rengê destavêtin, destdirêjî û bikaranîna wan ji bo fuhûşê tê pênasekirin. Li gorî lêkolîn û amarên cîhanî ji sedî 70 ji zarokên cîhanê di jiyana xwe de rastî destavêtin û destdirêjiya zayendî tên û salane 200 hezar zarok rastî vî sûcî tên. Lê li gorî UNICEF`ê li cîhanê ji sedî 83 ji qurbanên vî sûcî, sûc eşkere nakin û gilî nayên tomarkirin.

### Li Sûriyê hin sûcên destdirêjiya zayendî ya li hemberî zarokan yên sala 2022`yan


Li gorî UNICEF`ê ji ber hişmendiya şerm û tirsê û lêneborandina civakê ya kesê qurban ku zarok e, malbat vî sûcî vedişêre. Li Sûriyê jî ev rewş derbasdar e. Ji ber wê ti amarên fermî û ne fermî derbarê destdirêjiya zayendî ya li hemberî zarokan de nîne, lê herî dawî sûcên destdirêjiyê yên li hemberî zarokan yên sala 2022`yan wiha ne:
*Minbic, 28`ê Çileya îsal, termê keçeke 5 salî bi navê Yasmîn di Hawiya Ziblê (gelaşdanik) de hat dîtin. Li gorî SHOR`ê malbata Yasmînê piştî ku keça wan rastî destdirêjiya zayendî tê ji aliyê mêrekî ve, wê serjê dikin û diavêjin.
*12`ê Hezîranê li bajarê Babê yê di binê dagîkeriya tirkî û çeteyên wê de, çeteyekî koma EL-Cebhe Şamiyê destdirêjî li keçeke 5 salî kir.

*12`ê Hezîranê li kampa Heremîn ya Izazê ya di binê dagîkeriya tirkiyê de, keçeke 5 salî ji aliyê pisamê bavê xwe ve destdirêjî û lêdaneke giran lê tê kirin....
Helbet bûyerên ku li jor hatîn diyarkirin tinê yên hatîn ispatkirin û ji raya giştî re hatîn parvekir in.

### Di rewşa şer de sedema vî sûcî çi ye?

Têkildarî sedemên pirbûna van sûcan û çareseriyan, pispor û rehberê Derûnî Bengîn Ebdulah ji me re ev nirxandin kir: "Tundiya li hemberî zarokan û destdirêjiya zayendî ya li hemberî wan li Sûriyê berî Krîzê jî hebû. Lê di rewşa tevlihevî û krîzê de pirtir bûye. Lewra rewşa welat di çarçoveya valayiya, pevçûnê û şer de ye. Ji 2011`an ve ji ber krîzê, pirsgirêkên civakî li hev kom bûne; herwisa koçberî û kêmbûna hatina aborî ya malbatan, lewazbûna perwerdeyê, xizanî û bêkarî, van şertûmercan, hişmendiya civakê xerab kir û paş ve bir. Di encamê de derûniya civakê û bi taybetî ya mêr têk çûye. Herwiha nebûna saziyên şopdar, qanûneke tund sedemên bingehî ne. Jixwe ji ber rewşa aborî zewacinadina keçên temenpiçûk jî zêde bûye û pêş ketiye. Ji ber wê sûc û tundî bi giştî û bi taybetî li hemberî zarokan nexasim destdirêjiya zayendî pir bûye."

Pispor û rehberê Derûnî Bengîn Ebdulah herwisa teqez kir ku sedema bingehî ya vî sûcî bêçareseriya krîza Sûriyê ye û bi van agahiyan axaftina xwe qedand: "Çareseriyên demkî destpêkê bi pêşxistina hişmendiya civakê û bi parstina zarokan e. Divê jîngeheke alîkar û guncaw ji zarokan re bê avakirin. Divê pirtir alîkarî û baldarî ser perwerdeyê û saziyên wê bê kirin. Herwisa pêşxistina rewşa aborî. Lewra gelek malbat zarokên xwe dişînin kar û li kar ev sûc li hemberî wan tê kirin. Jixwe rola bingehî ya malbatan e ku çavdêrên zarokan bin û têkiliya wan bi zarokên wan re baş be û çanda wan ji her alî ve di navê de çanda zayendî bê pêşxistin ku zanebûna wan çêbe da ku bikarin xwe biparêzin."





## Berê Îran û Israilê li şer e!

**Ahmet AKTAŞ**

Li gorî salox û bûyerên rûdidin, Îran û Israîl berê xwe dane şerekî germ. Hewldanên her du dewletan ên li ber çavan tên dîtin, mirov dikare hinekan wiha destnîşan bike: Li Yemenê, Libnanê, yên herî nêzî Kurdistanê jî li Suriyê û Iraqê, rewşa heyî ya nêzî şerê germ e, li ber çava ne. Li van deveran, êdî ji lêdan û êrîşên ser kesên rayedar û baregehên leşkerî, gav bi gav ber bi şerekî berfirehtir diçe. Gotin û gefên rêveberên siyasî û fermandarên hêzên çekdarî yên van dewletan ku li hev dixwin, pêşbîniyên, li nêz wê şerê germ, yê nava dewletan dest pê bike xurtir dike.
Di van her du heyvên dawî de, êrîşên fûzeyên Îranê, hem li Bexdayê hem li Hewlêrê yên li ser baregehên leşkerî yên DYA û Israilê zêdetir bûne. Herwiha ji aliyê heman dewletên êrîşxwar jî bersîv tên dayîn.
Heman êrîşên ji her du aliyan ku dibin ser hev, ne bi tinê li Iraqê ye, li Libnanê û bi giranî li Suriyeyê jî bi hevwextî bi rê ve diçin.
Ev nakokî û êrîşên ser hev, ne bi tinê di nava Îranê û Israilê de germtir dibin, êdî nexweşî û nakokiyên navbêna Îran û Tirkiyê jî tûjtir dibin.
Wisa diyer e ku piştî şerê Ukraynayê, her hêz û dewlet xwe dide rex hevalbendên xwe û ji naçarî bi refên xwe re dibifirin. Bi gotinek zelaltir, êdî dewleta Tirkan, ji naçarî xwe dide rex DYA-NATO'yê. Di vî karî de, cih û erkê Israilê, weke tê zanîn xwedanê taybetmendiyeke cuda ye. Lewma, R.T.Erdogan, ew nakokiya demkî û şeklî ya navbêna xwe û Israilê rakir. Berî du rojan dîsa li gel Herzog bi telefonê axivî û piştî 3 rojan Wezîrê wan ê derve diçe Tirkiyê!
Herwiha di van rojên dawî de (17.6.2022), êrîşek fuzeyî li Zelkana bajarokê Başîka Musilê çû ser baregeha Tirka. Gûmana xurt; Iranê ev êrîş pêkaniye. Jixwe, diviya berî du hefteyan Wezîrê Derve yê Îranê çûba Tirkiyê, lê ev ger hate rawestandin! Herwiha ew civîna dawî ya ASTANA ku di navbêna Rûsya, Îran û Tirkiyê pêk hat jî, bêencam qediya.
Bi van mînakan û gelek sedemên din, nîşan dide ku hevalbendiya Rûsya-Îran-Tirkiyê êdî nikare dewam bike.
Bi taybetî jî, siyaset û berjewendên van her sê dewletan, li Iraq û Sûriyê yekser tên dijberî hev. Rûsya û Îran, ku li Sûriyê têk biçin, êdî li Rojhilata Navî bi giştî derbê dixwin û nexasim ji bo Îranê xeter pirtir dibe, ji ber ku piştî Sûriyeyê, êrîşa DYA û NATO berê xwe dide Îranê!
Israil, hewldanê Îranê yên ji bo afirandina çekên nukleerî, ji bo hebûna xwe xeter dibîne. Vê hefteyê tûnelên binerd yên kûr û dirêj li nêzî bajarê NATANZê dikolin, ji bo çêkirine çekên nukleerî. Israil ji vê hewldana Îranê gelek hêrs bûye!
Bêgûman Rûsya û DYA'yê ji van nakokî û pêşbîniya şerê germ ne bêrî ne. Berovajî, her du jî yekser têkildar in! Û germkirina vî şerê navbêna Îran û Israilê, ji aliyê Rûsyayê ve pêktê, weke ku tola xwe ji DYA digre; ya li Ukraynayê aniye serê wê, ew jî li vê herêmê tîne serê DYAyê!
Weke tê dîtin, vebûna vê enîya şer a di navbêna Îran û Israilê de, yekser li ser doza gelê Kurdistanê xeterê diafirîne. Lewma divê ji her alî pirtir Tevgêra Azadiyê û bi giştî gelê Kurdistanê ji vê xeterê hayîdar û amadekar bin!
Bêguman heke amadekarî hebe, bi her xeterê re derfetên kêrhatî jî hene!



# Çiyakurd bang li hikumeta başûrê Kurdistanê kir ku lêpirsînê bide destpêkirin

Bedran Çiyakurd ji hikumeta başûrê Kurdistanê xwest ku derbarê şehîdxistina têkoşer Ferhad Şiblî û hevriyên wî de lêpirsîneke zelal pêk bîne û got, rûdana kiryarên terorî li nava herêma başûrê Kurdistanê fikaran bi xwe re tînin.

Di 17'ê vê mehê de balafireke bê mirov a artêşa Tirk a dagirker wesayîtek ku cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser Ferhad Şiblî tê de bû ku wî ji bo tedawiyê berê xwe dabû bajarê Silêmaniyê kir armanc û di encam de têkoşer Ferhad Şiblî şehîd bû.

Rêveberiya Xweser bi daxuyaniyekê êriş şermezar kir û daxwaz ji hikumetên Bexda û Hewlêrê kir ku bi erkên xwe rabin û helwesta xwe li hember vê kiryara terorî eşkere bikin.

Her wiha ji civaka navneteweyî xweset ku zextê li dewleta Tirk bike ji bo ku kiryarên xwe yên aramiya herêmê têk dibe û serweriya dewletan bin pê dike, bi dawî bike.

Cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bedran Çiyakurd ji ber şehadeta Ferhad Şiblî sersaxî ji malbat, gelên herêmê û gelê Kurdistanê re xwest.

### 'Têkoşîna gelekî dikin hedef'

Bedran Çiyakurd diyar kir ku di şexsê şehîd Ferhad Şiblî û hevalên wî de, têkoşîna azadiya gelekî û kesayeta têkoşer a azad ku di pêkanîna armancên dîrokî yên gel de xwedî biryar û vîn e, hat hedefgirtin.

Çiyakurd ev êriş bi karekî tirsonek bi nav kir û got: "Sûcdar rihê têkçûna xwe eşkere kirin, dizanin ku kesên wekî Ferhad Şiblî dê dawiya wan bîne û rejîma wan a faşîst têk bibe."
Çiyakurd diyar kir ku rejîma Tirkiyê ji ber ku li hemû çeperên berxwedanê têk çûye dixwaze bi hedefgirtina gel û rayedarên wê serkeftineke sexte nîşan bide û da zanîn ku kiryarên terorî yên bi vî rengî vîna gel a ji bo têkbirina dagirkeriyê ji her demê zêdetir xurtir dike.

Bedran Çiyakurd got: "Hedefgirtina hevalê me Ferhad dema ku karê mirovî û sivîl li herêma Kelar a ku 200 km dûrî sînorê Tirkiyê ye, di çarçoveya rêzekiryarên terorî yên li hember têkoşerên gelê me yên li Başûrê Kurdistanê de pêk hat."
Çiyakurd der barê hedefgirtina rayedar û kesayetên welatparêz li Başûrê Kurdistanê de ji aliyê dewleta Tirk a dagirker ve got: "Ev tişt me xemgîn dike û diêşîne, li pêş çavê rêveberî, partî û hikumeta Başûrê Kurdistanê pêk tê, lê ew bêdeng in."

Çiyakurd teqez kir ku li ser hesabê azadiya gelê Kurdistanê, Başûrê Kurdistanê veguheriye qada dagirkeriya Tirk û hevkarên wê.
Bedran Çiyakurd di dewama axaftina xwe de ev pirs kir: "Çawa binpêkirina serweriya herêmê û Iraqê qebûl dikin çawa em dikarin bi hêsanî van binpêkirinên hewayî û bejahî derbas bikin. Pêkanîna kiryarên terorî li nava herêma Başûrê Kurdistanê gelek fikaran bi xwe re tîne."

Bedran Çiyakurd bang li hikumeta Başûrê Kurdistanê kir ku der barê buyera şehîdkirina Ferhad Şiblî û hevreyên wî de lêpirsîn dest pê bikin û encamên wê ragihînin.
Her wiha ji partiyên siyasî û gelê Başûrê Kurdistanê xweset kur li hember siyasetên dewleta Tirk û hevkarên wê helwest nîşan bidin.
Der barê bêdengiya hikumeta Iraqê jî de Çiyakurd got: "Hikumeta Iraqê berpirsyara parastina serweriya Iraqê ye, divê li hember binpêkirinên dewleta Tirk û hebûna baregehên wê yên leşkerî



li herêma Başûrê Kurdistanê tedbîran bigire."

Cîgirê hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Bedran Çiyakurd bang li civaka navneteweyî û rêxistinên navneteweyî yên peywendîdar kir ku parastina qanûnên navneteweyî bikin û sînorekî ji siyasetên dewleta Tirk ên li herêmê re deynin.
***ANHA***

## Di Roja Penaberan ya Cîhanê de Komîteya Koçberan banga piştgiriya penaberan kir

**Navenda Nûçeyan**

**Bi pêmana Roja Penaberan ya Cîhanê Komîteya Koçberên Serê Kaniyê daxuyaniyek da û tê de bang li civat û rêxistinên navneteweyeyî kir ku piştgiriya penaberan bê kirin û vegereke ewle bê misogerkirin.**

Di sala 2000`î de, roja 20`ê Hezîranê ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wekî roja penaberan hat pejirandin, û yekem car di salvegera 50`emîn ya peymana 1951`an ya têkildarî rewşa penaberan di 20`ê Hezîrana 2001`ê de hat pîrozkirin.
Bi vê boneyê, Komîteya Koçberên Serêkaniyê daxuyaniyek da.

### 'Divê roja penaberan ya cîhanî bibe bingeha piştevaniya penaberan'

Komîteyê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku pêwîste ev roja cîhanî ya penaberan li ser bingeha hestyarî û piştavaniya penaberan li cîhanê bê kirin û wiha got: "Ji bo ku wek xelatkirina penaberan bê nasîn û rojevê bibe ser rewşa penaberan, divê ev roja cîhanî ya penaberan li ser bingeha piştavaniya penaberan li cîhanê bê kirin."
Komîteyê di dewama daxuyaniya xwe de da zanîn ku ev roj ne tenê ji bo bîranîn û mafê koçberan hatiye destnîşankirin, lê belê ji bo piştevaniya cihdana ji penaberan re da ku bikarin jiyana xwe berdewam bikin. Her wiha penaberên ku bi darê zorê ji cih û warên xwe hatine derbiderkirin, bên vegerandin li cih û warên xwe.

### Şerê ku dibe sedema êş û penaberiyê bi erêkirina hêzên navnetewyeyî pêk tê

Komîteyê destnîşan kir ku li Sûriyê ji ber şer, her ku diçe hejmara penaberan zêde dibe, bi taybet kesên ku bi darê zorê ji cih û warên xwe hatine koçberkirin û wiha got kir: "Ji ber siyaseta heyî ku li ser jiyana wan dibe metirsî weke siyaseta ku îro li Serêkaniyê, Girê Spî ji aliyê dewleta tirkî û çeteyên wê ve tê kirin ku bû sedema koçberkirina gelê me."
Komîteyê bal kêşa ser rewşa gelê Serêkaniyê ku ji sala 2019`an ve ji ber dagirkirina bajarê wan ji aliyê dagirkeriya tirkî ve, di mercên zehmet yên penaberiyê de dijîn û got: "Şer dibe sedema penaberiyê û zêdekirina êş û azarê, ev yek jî di encama erêkirina hêzên navneteweyî li ser hesabê civakan pêk tînin."
Komîteya Koçberên Serêkaniyê di dawiay daxuyaniya xwe de bang li cîhanê, civak û rêxistinên navneteweyî kir ku piştevaniya penaberan bê kirin û vegera ewle li bajar û gundên xwe bê mîsogerkirin.

## 'Nêzîkatiya esasî ya Abdullah Ocalan jiyana hevpar ya gelan e'

**Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Ozgur Erol got, "Abdullah Ocalan ji bo jiyana hevpar ya gelan her tim bi kûrayî û cidî xebitiye. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurdî pêşniyarên çareseriyê yên berfireh pêşkêş kirine."**

Ji parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Ozgur Erol qala nêzîkatiya Ocalan a di hevdîtina 2011'an de kir. Parêzer Erol diyar kir ku hevdîtinên bi Abdullah Ocalan re têne kirin bandorê li jiyana li Tirkiyeyê dikin û got, di hevdîtinên pêvajoya çareseriyê de ku sala 2012'an destpê kir, hate dîtin ku li gel şert û mercên girtinê jî Ocalan bandoreke erênî li asta jiyanê kiriye. Erol astengiyên li pêşiya 'Meşa Gemlîkê ya Mezin' rexne kir.
Erol diyar kir ku herî dawî di 18'ê Tîrmeha 2011'an de bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re li Girava Îmraliyê hevdîtin kiribû û ragihand ku piştî wê hevdîtinê di 27'ê Tîrmehê de jî hevdîtinek pê re hate kirin, lê ji wê demê heta 2019'an parêzeran nekarîn hevdîtinê pê re bikin.
Erol bak kişand ser salên ku li Îmraliyê hevdîtin hatin ikrin û got, "Abdullah Ocalan li Îmraliyê her tim ji bo çareseriya meseleya Kurd pêşniyarên çareseriyê yên berfireh kir. Ji parastina destpêkê ya li dadgehê heta bi pêşkêşiyên salên 2000 û 2004'an ên ji bo Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê, nexşeya rê, hemû ji bo çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd a li Tirkiyeyê nêzîkatiyên cidî û kûr bûn."
Parêzer Erol anî ziman ku Rêberê Gelê Kurd ev nêzîkatiya xwe di dema hevdîtinan de jî bi rêk û pêk û hevgirtî nîşan da û wiha dewam kir, "Nêzîkatiya wî ya esasî hem li Tirkiyeyê hem jî li Rojhilata Navîn ji aliyê pirsgirêka Kurdan ve, li xaka ku Kurd bi gelên din re bi hev re dijîn, jiyaneke bi hev re û biratiyê ya li ser bingeha welatiyên azad û wekhev bû."

### Tecrîd ji aliyê mirovî ve nayê qebûlkirin

Erol li ser 'Meşa Gemlîkê ya Mezin' ku li gel astengiyan jî bi piştgiriya xurt a gel pêk hat, wiha axivî: "Mirovan bi daxwaza rakirina tecrîdê hewl dan mafê xwe yê meşê û azadiya îfadeyê bi kar bînin. Tevî ku ti hewldaneke tundiyê û mehleyeke ji bo tundiyê tune bû jî, rê hemû hatin girtin. Mesele bi esasî wiha ye; ji dewamkirina tecrîdê jî wêdetir helwesteke welê tê nîşandan ku nêzîaktiyên ji bo şikandina tecrîdê jî hewl didin tecrîd bikin. Mixabin hevdîtinên ku ji sala 2016'an û vir ve li Îmraliyê hatin kirin, tenê di encama bilindbûna muxalefeta civakî de pêk hatin. Tecrîdkirina mirovan ji hemû mafên xwe, ferzkirina jiyaneke bi vî rengî êdî ne tenê ji aliyqê hiqûqî û siyasî ve, her wiha ji aliyê însanî ve aliyekî wê yê bê qebûlkirin nîne."

### Tecrîd parametreya demokrasiyê ye



Endamê Buroya Hiqûqê ya Sedsalê Parêzer Ozgur Erol destnîşan kir ku tecrîda heyî êdî ji bo asta demokrasiyê ya li Tiriyeyê parametreyeke û wiha dewam kir, "Em bala xwe bidin ser hemû pêvajoyên 20 salên dawî yên li Tirkiyeyê; Her dema ku li Îmraliyê hevdîtin hatiye kirin û li ser çareseriya pirsgirêka Kurd nîqaşek hatiye kirin, asta aborî, siyasî û demokratîk a Tirkiyeyê hinekî aram bûye, bûye welatekî ku dikare lê bê jiyîn. Demên ku tecrîd hate şidandin jî Tirkiye ji her alî ve ketiye nava krîzê. Lewma daxwaza mirovan nabe ku ji vê rastiyê cuda bê nirxandin."
***ANF***

# Berxwedana Îmralî bû roniya qehremanan

Jinên bajarê Qamişlo tecrîda li ser Rêber Apo şermezar kirin û gotin; berxwedana Rêber Apo ya li Îmralî, ji bo gel bû hêviya herî mezin ya serkeftinê, herwiha bi vê berxwedana xwe pir qehreman û berxwedêr gihandin.

**Miheme Xanim /Qamişlo**

Hêzên kapîtalîst û desthilatdar yên komploger, bi plangeriyeke navneteweyî Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocelan, dîl girtin.
Ev komplo di şexsê Rêber APO de, li ser gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî bi peyman û hewldana planên nû yên qirêj dewam dike. Hêzên kapîtalîst, bi armanca tinekirina nirxên civaka azad, wekhevî û jiholêrakirina Modernîteya Demokratîk, komplo pê şxistin. Rêber APO bi pêşxistina berxwedana dîrokî, bi heqîqeta avakirina civaka azad rastiya komplogeran pûç kir. Hêzên komploger, ji ber ku li hemberî berxwedan û tekoşîna mezin ya Rêber APO bin ketine, bihêrs in û îro Rêber APO di nava tecrîdeke giran de digirin.
Jinên bajarê Qamişlo tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan şermezar kirin û bang kirin ku gelên azadixwaz tev li hember vê tecrîdê xwedîhelwêst bin û li rêberê azadiyê xwedî derkevin.



**'Tecrîda li ser Rêber Apo tecrîda li ser azadiyê ye'**

Dayîka bi navê Sîham Mihemed ku hevjîna şehîd e û dayîka şoreşgerekî ye, tecrîda li ser Rêber APO şermerzar kir û wiha got: "Rêber Apo, rêber û hêviya tevayiya neteweyên bidest e. Tecrîda li ser Rêber APO, mirov dikare bêje tecrîda li ser azadiya mirovayiyê ye. Lewra di sedsala 21'ê de fikrê li dijî sîstema desthilatdar ya kapîtalîst, fikrê Rêber Apo ya Neteweya Demokratîk e. Ji bo wê dewletên hegemon, Rêber APO dîl girtin û radestî dewleta tirkî ya faşîst kirin. Lê dîsa jî nikarîn pêşî li belavbûna pergala wî bigirin. Ji bo wê wek tohilanîn, dest bi tecrîda girankirî kirin."

**'Gelên azadîxwaz li dora felsefeya Rêber Apo kom dibin'**

Dayîka Sîham da xuyakirin ku felsefeya Rêber Apo rojbiroj dibe modêla jiyaneke azad û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Rêber Apo pergala xwe ya Neteweya Demokratîk bi pirtûkên xwe bi gel da nasîn. Gel û kesên demokrat û azadîxwaz encam jê girtin. Rêber Apo gelê Kurd ji mirinê vegerand, Kurdên azad afirand û ji bo gelê Kurdistanê jiyaneke azad afirand."
Dayîka Sîham Mihemed ji gelên azadîxwaz xwest ku li dijî tecrîdê dengê xwe bilind bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Ji bo şkandina tecrîda li ser Rêbertiyê, divê em bikarin fikir û felsefeya wî di tevayiya jiyana xwe û di sîstema xwe de pêk bînin. Ji bo ku em Rêberê xwe ji nava çar dîwaran derxin, divê 24 saetan em di nava kar û xebatê de bin. Herwiha em bangî tevayiya gelên azadîxwaz dikin ku li rêberê azadiyê xwedî derkevin."

**'Divê em li xwediyê felsefeya çareseriyê xwedî derkevin'**

Jina bi navê Xaliya Ebduqadir jî, tecrîda li ser Rêber Apo wek tecrîda li ser jiyana azad pênase kir û wiha got: "Dewleta tirkî ya dagîrker ji hevdîtina bi Rêbertiyê re ditirse. Eger hevdîtin were kirin wê perspaktîfên Rêbertiyê hem ji bo gelê Kurd, hem ji bo tevayiya gelên azadîxwaz derkevin pêş û wê her kes van perspektîfan ji xwe re bike çavkanî. Civaka azadîxwaz û demokratîk tev serkeftina xwe di fikira Rêber Apo de dibînin û ev ji bo faşîzma desthilatdaran metirsiyan ava çêdike."



Xaliya diyar kir ku bi berxwedanê wê faşîst negihîjin armanca xwe û axaftina xwe wiha qedand: "Ne dewleta tirkî ya dagîrker tenê ji fikirê Rêbertiyê ditirse, dewletên hegomon jî tev ditirsin. Ji ber wê destekê didin dewleta tirkî. Armanca wan fikrê azad ji holê rakin, lê Rêber APO bi gelên azadîxwaz re ev plan bêbandor kir. Berxwedana Rêber Apo li Îmralî li hemberî faşîzmê dimeşîne ji bo gel bûye hêviya serkeftinê. Ji bo wê her kesê xwedî wijdan û li dijî roxandina civakîbûnê derdikive, divê li Rêber Apo xwedî derkeve."

# 'Rojava ji bo Rojhilata Navî modela çareseriyê ye'

**Ji YPJ`ê Enternasyonal Comrade Dîlan ragihand ku pêkhateyên li Rojava hemû tevlî avakirina civaka demokratîk û şoreşê bûne û diyar kir, ku modela Şoreşa Rojava dikare ji tevayiya Rojhilata Navî re bibe çareserî.**

Jinên ku ji çar aliyên cîhanê bi dilxwazî hatine Rojava, di avakirina jiyaneke azad de bi roleke girîng radibin. Ev hêza ji parastina jinê, di din sîwana YPJ Enternasyonal de mezin dibe. Ji YPJ`ê Enternasyonal Comrade Dîlan bersiv da pirsên ANF'ê.
Li ser rêxistiniya xwe Comrade Dîlan got, "YPJ Enternasyonal rêxistiniyeke enternasyonal e ku di bin sîwanê Yekîtiyên Parastina Jinê (YPJ) a Rojava de ye. Enternasyonalên dilxwaz di çarçoveya Konfederalîzma Demokratîk de bi rêxistin dike, perwerde dike û bi rengekî çalak tevlî şoreşa jinê dike. Bi rêya YPJ'ê ku bi serketina Kobanê ya dîrokî re li tevahiya cîhanê deng veda, hîn bêhtir jinan xwe gihandin me û serlêdan kirin ji bo tevlî nava vê hêzê bibin. Di çarçoveya vê daxwaza zêde de pêwîstî bi rêxistiniya Tabûra YPJ Enternasyonal hate dîtin û me bi vî rengî dest bi kar kir. Gihîşt wê qonaxê ku jin perwerdeya leşkerî û siyasî lê dibînin, civak û zimanê Kurd ji nêz ve nas dikin, li qadên cuda ji bo têkoşînê xwe amade dikin."
Comrade Dîlan diyar kir ku Şoreşa Rojava avaniyeke demokratîk ava kir ku civak bi rêya komun û meclîsên xwecihî xwe bi rêxistin dike û got, "Jin li her qada civakê avaniyên jinê yên xweser ava dikin. Sîstema hevserokatiyê dike ku jin tevlî rêveberiya siyasî bibe. Perwerde defetê dide ku bi rêya akademiyan xwe bi rêxistin bike. Bi kooperatîfên jinê re jî şensê serxwebûna aboriyê dide. Jineolojî, bingeha zanistiya şoreşa jinê destnîşan dike. Yekîneyên edaleta jinê, misogerkirina edaletê ji xwe re dikin armanc. Bi YPJ'ê re jinan hêzên xweparastinê ava kirin. Ev serketin hemû ji bo jinên li tevahiya cîhanê hatin afirandin."



Comrade Dîlan anî ziman ku enterasyonalîstên YPJ'ê jî ev potansiyela şoreşê, ne tenê weke perspektîfeke xweser a ji bo gelê Kurd, di heman demê de ji bo xwe jî weke perspektîfê dîtin û got, "Ji Elmanyayê Îvana Hoffman, ji Îngilistanê Anna Campbell û ji Arjantînê Alîna Sanchez, her wiha şoreşgerên mîna wan li nava refên YPJ'ê şehîd bûn. Ew nîşaneya serxistina armanca jinên hatine Rojava ne. Ji çar aliyên cîhanê jin li vê derê azadiyê dibînin. Lewma jî dixwazin tevlî parastina Rojava bibin."
Têkildarî sedema êrişên ewqasî giran ên li ser Şoreşa Rojava, Comrade Dîlan wiha axivî: "Faşîzma Tirk û çeteyên DAÎŞ'ê êrişî herêmên rizgarkirî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin. Bi dagirkirina van herêman re dixwazin sîstema xwe ya zordarî û dijminatiya li jinê serwer bikin. Şoreşa Rojava ne tenê şoreşeke Kurd e. Xwe dispêre Paradîgmaya Neteweya Demokratîk a Abdullah Ocalan ku her ol, çand û avaniya etnîkî di nava xwe de vedihewîne. Yekîtiya pêkhateyên li herêmê ji xwe re dike armanc. Hemû pêkhateyên li Rojava tevlî avakirina civaka demokratîk û şoreşê dibin. Modela Şoreşa Rojava ji bo tevahiya Rojhilata Navîn dikare çareseriyê pêşkêş bike. Şoreşa Rojava ji bo hêzên ku Rojhilata Navîn dikin qada şerê etnîkî, metirsî ye."
Comrade Dîlan ragihand ku YPJ Enternasyonal ji bo jinên li azadiyê digerin, dixwazin şoreşê fêhm bikin, bi pêş ve bibin û parastina wê bikin, cihê jinê ye û got, "Her kesên dixwazin xwe bi pêş bixînin û perwerde bikin, dikarin tevlî me bibin."
***ANF/Mûstafa Çoban***



## Serkeftina Metîna li Rojava nîşan e!

**Dilyar Cizîrî**

Dewleta Tirkan ji 17'ê Nîsanê ve êrişên xwe yên li dijî herêmên Zap, Metîna û Avaşîn bênavber didomîne. Gêrîlayên HPG/YJA-STAR derbên giran li êrişkaran xistin. Ev bi çalakiyên bi dîmen ên Gêrila TV diweşîne hatine belgekirin. Di heman demê de bîlançoya 2 mehan a navenda ragîhandinê ya HPG'ê weşand, têkçûnên Artêşa Tirkan xweş diyar dike.
Dewleta Tirkan ev têkçûn tehemûl nekirin, li bakurê Kurdistanê dest bi hemleyên girtin û serdegirtinê kir. Di encamê de 20 rojnamevan jî di nav de hejmarek welatî binçav kirin. Di heman demê de zext û zordariya xwe ya li ser HDP'ê û sazî û dezgehên bakurê Kurdistanê zêde kirin.
Di heman demê de gefên li ser bakur û rojhilatê Sûriyê zêde bûn. Erdogan bênavber ket nava lêgerînê da hêzên navdewletî yên wekî Rûsya û Amarîka razî bike. Ji bo wê mijara firehkirina NATO û derbasbûna Swêd û Filenda istismar kir.
Li aliyê din jî zext û zordariya li ser Şingalê û bikaranîna alîgirên PDK'ê bi xurtî xistin dewrê. Bi riya agahiyên ji rêxistina PDK'ê Parastin, digirtin kesayetên Kurd bi dirûnan bombebaran dikirin. Bûyera dawî jî ya Kelera Başûr ku di encamê de Ferhad Şiblî jî di nav de komek welatparêz tê de şehîd bûn, yek ji mînakên li ber çavan e.
Ev xalên behsa mijarê di çarçoveya heman konseptê ji aliyê dewleta Tirkan ve tên kirin. Pê re jî niha li Rojava û bi taybetî ji Efrîn, Bab û heta Cerablus û sînorê Kobanê çembera reş ava dikin. Di vê çembera ji aliyê QSD'ê ve hate eşkerekirin de komên radîkal û tundrew ên mîna DAIŞ'ê (Cebhet El-Nusra, Huras El-Dîn, Ehrar El-Şerqiye û hew…) li xetên eniyên pêş bi cih dikin.
Bi vê plana xwe jî dewleta Tirkan wê çawa berê DAIŞ'ê bi kar anî, wê van çeteyan niha bi kar bîne. Wiha jî wê zemîna têkbirina Rêveberiya Xweser û tengavkirina wê piratîze bikin.
Lê di vir de tişta hişt planên dewleta Tirkan ên wekî guhertina demografî ya di herêmê de û heta serkeftinên leşkerî yên lê digeriya bi ser nexistin, serkeftinên gêrîla ne.
Bi wate eger ne serkeftinên gêrîlayan li Zap, Metîna û Avaşîn bûya, wê Erdogan soza xwe ya êrişa nû ya li dijî Rojava pêk baniya, herwiha wê bi xurtî li dijî Şingalê planên xwe piratîze kiribana.
Li Bakur jî wê tecrîda li ser xebatên HDP'ê û tevgera siyasî hîn zêdetir kiribana. Lê di vir de hêja ye, mirov wan çalakiyên gêrîla û berxwedana li Zap, Metîna û Ava Şîn di dîrokê de belge bike.
Ji ber bi van serkeftinan hêmanên bingehî yên avakirina sengerên zêrîn ji bo parastina destkeftiyan hate sazkirin. Ev jî wê di demên pêş de bi têkçûna çembera reş û rizgarkirina herêmên dagîrkirî li bakur û rojhilatê Sûriyê tacdar bibe. Di heman demê de wê bibe xeta têkçûna xayîn û koleyan. Bi bandora wê jî dibe aramî li herêmê pêk were û ev jî hêmanê bingehî yê têkçûna siyaseta AK û MHP be.



# ' Dewleta Tirkan li hêviya teqaîna kampa Holê û girtîgehên çeteyan e'

Hevserokê Yekîtiya Parêzeran ya Reqayê şiyarî da ku gefên dewleta Tirkan ya dagîrker derfetê didin ku şaneyên çeteyên DAIŞ`ê careke din vegerin herêmê û got, hebûna DAIŞ`ê mîna bombeyeke li ber teqînê ye ku gefan li Rojhilata Navî bi giştî dixwe.

Li bakur û rojhilatê Sûriyê bi hezeran çeteyên DAIŞ`ê hene ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê barê wan ên madî û ewlehî digre ser xwe. Dewleta Tirk gefan dixwe ku dê êrişên nû ên dagirkirinê pêk bîne. Bi vê yekê dê destekê bide şaneyên DAIŞ`ê ku li herêmê çalak bibin û dê xeteriya çeteyên girtî jî zêde bike.
Têkildarî mijarê Hevserokê Yekitiya Parêzeran a Reqayê, parêzer Xalid El-Hesen ji ANHA`yê re wiha axivî: "Rejîma Tirk gefên pêkanîna êrişên dagirkirinê li ser xaka Sûriyê didomîne, vegerandina koçberên sûrî û bicihkirina wan dike hincet da ku beşek ji herêmê qut bike. Lê di aliyê qanûnî de û li gorî biryara 2254'an ev yek li derqanûnî ye, ji ber ku vegerandina bi darê zorê sûcekî şer e."

**'Êrişa Tirkiyê wê belavbûna şaneyên DAIŞ`ê zêde bike'**

Xalid El-Hesen bal kişand ser armac ji êrişên Erdogan û wiha domand: "Armanca Erdogan çeteyên DAIŞ`ê vejîne, xaka Sûriyê dagir û parçe bike. Li Bakur û Rojhilatê Sûriyê kampa Holê heye ku nêzî 60 hezar malbatên çeteyên DAIŞ`ê têde dijîn. Heger dewleta Tirk çi êrişê li ser herêmên me pêk bîne dê valatiyeke ewlehî çêbibe û derfetê bide çeteyan ku jinûve xwe birêxistin bike."
Xalid El-Hesen di berdewamiya axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Em qanûnsaz, rojnamevan û pêkhateyên herêmê divê li dijî planên qirêj ên Erdogan bikevin tevgerê. Erdogan bi rêya bicihkirina milyon koçberên sûrî li avahiyên mêtîngeriyê yên ku li herêmên dagirkirî ava kirin dixwaze planên xwe bi cih bîne. Dewleta Tirk nasnameya tirkî daye penaberan da ku ji wan re bêje hûn welatiyên tirk ne weke ku çawa li Lîwa Îskenderon kir."
Xalid El-Hesen destnîşan kir ku dewleta Tirk dixwaze sûdê ji şerê Rûsya – Ukraynayê bigre dema ku Rûsya beşek ji xaka Ukraynayê bi hinceta ku şêniyên wê ji gelê rûsî ne qut kir, dewleta Tirk jî dixwaze sûdê ji vê tecrubeyê li ser hesabê xaka gelê Sûriyê bigre.

**Dewleta tirkî li hêviya teqîna kampa holê ye**





El-Hesen di axaftina xwe de ev tişt anî ziman: "Erdogan dixebite da ku şaneyên DAIŞ`ê li herêmê vejîne. Ev şane fikreyên Erdogan û xebatên wî yên îxwanî û sûcdarî li dijî Sûriyê pêk tîne. Em texmîn dikin ku DAIŞ`ê dê venegere, lê dewleta Tirk dixwaze derbas be û li hêviya teqandina kampa Holê û girtîgehên çeteyan e ji ber ew li herêmê mîne bombeyek li ber teqînê ne.
Xalid El-Hesen destnîşan kir ku li dijî her êrişan pêwîstî bi xurtkirina xebata hevpar a şêniyên herêmên bi saziyên wê yên leşkerî û sivîl re heye.
Parêzer El-Hesen îşaret bi xebatê şervanên QSD`ê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn kir ku r êrişa li ser girtîgeha Sînaayê têk birin û wiha axivî: "Erdogan matmayî ma dema hêzên me li hember êrişa li ser girtîgeha Sînaayê sekinîn. Her wiha ji girêdana gel bi hêzên leşkerî û Rêveberiya Xweser re jî matmayî ma. Mademî ev hevgirtin heye em dikarin li hember çi êrişa li ser herêmê bisekinin."
El-Hesen got siyaseta Erdogan her kesî dikeve armanc û wiha axivî: "Pêwîstiya me bi xebateke xurttir a çapemenî, qanûnî û rêveberî heye da ku em sûcên Erdogan û sûcên şer ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê û herêmên dagirkirî pêk tîne teşhîr bikin."
Hevserokê Yekitiya Parêzeran a Reqayê Xalid El-Hesen îşaret bi rola gelê herêmê kir ku şerê DAIŞ`ê kir û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Dema DAIŞ`ê dest pê kir, gelek dewletan şerî wî nekir. Bi awayekî mezin li herêmê belav bû û gef li hemû dewletên Ereb û Ewropayê diwar. Bi hevgirtina gelên herêmê ev rêxistina xeternak têk çû. Îro dema ev gef têne xwarin derfetê dide çeteyên DAIŞ`ê û şaneyên wî ku xwe birêxistin bikin û jinûve xeteriyekê li ser Rojhilata Navîn û Ewropayê çêke ne tenê li ser Sûriyê."
***ANHA***

# 'Tenê bi hevgirtin û yekîtiyê em dikarin pêşî li êrişan bigirin'

Ji rûspiyên Şingalê Berekat Mirad got, heta hevgirtina gel çênebe wê dijmin her tim êriş bike û diyar kir ku tenê bi yekîtiyê pêşî li fermanan tê girtin. Herwiha têkildarî lîstik û provokasyonên li ser Şingalê jî hişyarî da.

Di 15'ê Hezîranê de dewleta Tirk a dagirker êriş bir ser Meclîsa Gel a Sinûnê ya Şengalê. Di encama êrişê de Saleh Xidir Naso yê 12 salî şehîd bû û 7 kes birîndar bûn. Xizmê birîndaran Berekat Mirad nerazîbûn nîşanî êrişê da û destnîşan kir ku di şexsê gelê Êzidî yên li Şengalê de êriş li hemû Kurdan hatiye kirin.
Berekat Mirad diyar kir ku ne cara yekem e êriş tê kirin û got, "Bi berdewamî herêmên me tên topbarankirin.
Lê li hember van êrişan tu nerazîbûn tune ye. Ne tenê em, êrişî tevahiya gel tê kirin. Divê hikumeta Iraqê jî li hember êriş û zilma ku li xelkê Êzidî tê kirin xwedî helwest be. Bila her kes destê xwe deyne ser wîjdana xwe û lê binêre, ev kiryarên dewleta Tirk dike di kîjan olî de heye? Di kîjan zagonan de derbas dibe ku dewletek bi balafirên şer li sivîlan bixe û qetil bike?"
Li dijî êrişan banga hevgirtinê Berekat Mirad li hember provekasyonên PDK'ê jî xelkê Êzidî hişyar kir û wiha dewam kir, "Divê gelê me yekîtiya xwe xurt bike, dest bidin destê hev. Bila nebin lîstika partiyên siyasî. Divê gelê Êzidî bi hevgirtina xwe li dijî êrişan bibin bend. Em zanin ku ev êriş jî bi desteka hin partiyên siyasî pêk hat. Gelo zarokekî 12 salî çi guneh kiriye ku bibe hedefa balafirên şer?"
Berekat Mirad got, "Divê ev yek neya qebûlkirin û divê ji aliyê tevahiya gel ve bên şermezarkirin. Îro dem hatiye ku hemû gelê me, ji serok eşîran heya tevahî civakê çi ji destê wan bê divê bikin. Şengal di nava planên herêmê û navneteweyî de ye."



Berekat Mirad da zanîn ku heya hevgirtina gel çênebe wê her dem dijmin êrişê wan bike, ji hev qut bike û perçe bike. Berekat anî ziman ku tenê hevgirtin û yekîtî dikare pêşî li fermanan bigIre.
***ANF***

## Gelê Sûriyê şer naxwaze

**Zekî Bedran**

Dewleta tirkî gefên ser Sûriyê didomîne û ji bo êrişên dagîrkeriyeke nû amadekariyê dike. Gelê Sûriyê şer naxwaze. Sûriye ji şer kerixiye. Bi milyonan sûriyeyî li derveyî welatê xwe koçber in. Li hundir jî bi milyonan ji ciyê xwe bûne. Hêzên li dinyayê bibandor jî ji şerê li Sûriyê aciz bûne. Ku ji bo çareseriyê ne amade bin jî herî kêm alîgir in ku sar bibe.
Li hemberî êrişên Tirkan Amerîka û Rûsya ne xwediyên helwesteke cidî ne. Eger cidî bûna dewleta Tirkan evqas gef nedixwarin û Sûriye nedikir rehîne. Halê hazir herêmên di binê dagîrkeriya Tirkan de ji bo dinyayê tevê çavkaniya gef û xeterê ne. El Nusra û rêxistinên din ji ku ji aliyê dinyayê tevê ve terorîst hatine qebûlkirin, li Idlibê bi awayekî fermî rêveber in. Artêşa Tirkan van hêzan diparêze. Li gorî lihevkirina bi Rûsya re diviya Tirkiye wan ji Idlibê derxe, yan jî bêçek bike. Lê Tirkiye tersê wê dike. Îro ne Amerîka van hêzan nîqaş dike, ne Ewropa ne jî Rûsya. Tirkiye naxwaze bikevin rojevê jî.
Dewleta tirkî li herêmên dagîr kirîn yên weke Eftîn û Serê Kaniyê qirkirina neteweyî kir. Bi dehhezaran çeteyên biçek bi rêxistin kirin û berdan ser serê gel. Li wan herêman rêxistinên weke DAIŞê û El Nusra bi awayekî azad bi rêxistin dibin. Bexdadiyê serkêşê DAIŞ'ê û serkêşên din li herêmên di binê parastina Tirkan de hatin kuştin yan birîndarkirin. Ti kesî hesabê vê ji Tirkan nexwest.
Tirkiyê ev bêdengiya dinyayê û nakokiyên navbera Amerîka û Rûsya heta dawiyê bi kar anîn. Got, ezê her bazara qirêj bikim, sûcûn herî giran bikikm pişt re jî bi van dewletan re li hev bikim. Lewra ev dewlet ji bo berjewendiyên xwe hiqûga navneteweyî dan aliyekî. Kê ev wêrakî da Tirkiyê ku li Sûriyê eşkere sûcên dermirovî bike û erdê wê dagîr bike? Diyar e ku di serî de Amerîka û Rûsya tên. Eger Amerîka qada hewayî venekiribûna û erê nekiribûna, Tirkiyê nikariya dagîr bike. Niha jî wisa ye. Gefên Tirkiyê çi dibin bila bibin, eger Amerîka û Rûsya qada hewayî venekin û erê nekin tevgera dagîrkirinê pêk nayê.
Sûriye ji şer kerixî. Lê Tirkiye hê jê têr nebûye. Hê bikelecan dixwaze bi dagîrkirinê bi sedhezaran ji ciyê wan bike û Sûriyê di nava pirsgirêkan de bifetisîne. Tirkiye wî mafî bi xwe re dibîne ku welatekî cîran di binê piyê xwe de biperçiqîne û paşroja wê tarî bike. Heman tiştî li Iraqê jî dike. Dibêje hêza min heye ezê bikim.
Li Rojhilata Navî û Asya çiqas rêxistinên bixeter hene tev di binê parastina Tirkiyê de ne.
DAIŞ, El Nusra, Ixwanî û rêxistinên din niha li herêmên di binê dagîrkirina Tirkan de ne. Dewletên Rojhilata Navî, Amerîka, Rûsya û Ewropa destê xwe ji van rêxistinan kişandin. Lewra ji bo tevayiya dinyayê xeter bûn. Rêxistinên weke DAIŞ'ê bi koalisyonên navneteweyî hatin bêbandorkirin. Gelên herêmê berdêlên giran dan. Gelên dinyayê jî wisa. Ev rêxistinên dinyayê bi berdêlên giran lewaz kirîn, Tirkiye wan diparêze û bihêz dike. Îro wan li hemberî Kurdan û Sûriyê bi kar tîne. Wê sibê li hemberî welatên erebî û gelên din jî bi kar bîne.
Tirkiye bûye navenda rêxistinên terorîst. Tirkiye eşkere terorê vediguhêze dinyayê. Di vê mijarê de me gotinek ji sekreterê giştî yê NATO nebihîst. Ew her tim dibêje Tirkiye ku endama NATO ye, ji terorê pir kişandiye. Behs nake ka wê endama NATO sedê salan de çi felaket anîne serê Kurdan. Yê Tirkiye evqas kirîn êrişkar û azadiya sûc dayînê yên weke Stoltenberg in.
Rawestandina vê êrişkariyê ne pir zor e. Eger rêveberiya Şamê rola xwe bilîze wê Tirkiye di ciyê xwe de raweste û tiştekî ku bike namîne. Ev mûmkin e. Eger rêveberiya Şamê bi gelê bi gelê bakur-rojhilatê Sûriyê re li hev bike û yekîtiyê pêk bîne, wê dagîrkerên Tirk nikaribin tev bigerin. Wê Sûriye jî bilez xwe komî ser hev bike. Wê beşeke mezin ya welat bibe yek û bingehê Sûriyeya demokratîk biavêje. Li Sûriyeke yekîtiya xwe pêk anî û gavên demokratîk avêtîn wê moralê gel bilind bibe û baweriya bi xwe xurt bibe. Wê demê wê ti kes nikaribe pêşiya wan bigire.
Faşîzma tirkî nijadperest e, êrişkar e û cîranên xwe tehdîd dike. Li dû dagîrkeriy ye. Halê hazir li Sûriye û Iraqê beşeke girîng dagîr kirine. Li hemberî artêşa Sûriyê artêşeke dijber ava kiriye. Li Iraqê jî bi heman rengî tev digere. Dewleta tirkî dijminiya Kurdan tenê nake, dijmina gelên Rojhilata Navî ye jî.